# Bultena heftane

# 6/1/2024

Email: **starmalper13@gmail.com**

Facebook:kongra star-مؤتمر ستار

Youtube: kongra.star22@gmail.com

Nûçeyên ji cîhanê

## Ji WHO'yê perwerdehiya li dijî tundiya li ser jinê

NAVENDA NÛÇEYAN - Ofîsên herêmî yên Ewropa û Rojhilata Navîn yên Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) xizmetek ji bo başkirin û pêşvebirina tîmên tenduristiyê yên li ser jinên mexdûrê tundiya fîzîkî û cinsî kar dikin, dan destpêkirin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/224657

Çavkanî:JINNEWS




## Femînîstên li Fransayê li dijî 'cîhana zayendîparêz a kevn' di çalakiyê de ne

NAVENDA NÛÇEYAN - Kolektîfa ku ji komeleyên femînîst pêk tên gotin, "Cîhana we ya berê bila ji we ra be, em cîhaneke ji tundiyê û zayendîperestiyê dûr dixwazin" û banga tevlîbûna çalakiyê kirin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/224796

Çavkanî:JINNEWS



# Etiyopya bi qeyrana herî tund a xurekê ya cîhanê re rû bi rû ye

Hat ragihandin ku Etiyopya ji ber karesetên ji ber guherîna avhewayê pêk tên, bi qeyrana herî tund a xurekê ya cîhanê re rû bi rû ye.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/etiyopya-bi-qeyrana-heri-tund-a-xureke-ya-cihane-re-ru-bi-ru-ye-43081

Çavkanî:JINHA



**Rojhilata navîn**

# Diyanetê dîsa jinan hedef girt

Serokatiya Karûbarên Diyanetê li ser pirsa li ser jiyana karker a jinan wiha bersivand: "Karkirina jinê bi destûra hevjînê wê ye."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/diyanete-disa-jinan-hedef-girt-42983

Çavkanî:JINHA

# Jinên Libnanê yên ji ber êrîşan reviyan di şert û mercên giran de dijîn

Jinên ku ji gundên başûrê Libnanê ji ber topbarana Îsraîlê koç kirin, koçî bajarê Tîre bûn û li dibistanên giştî yên bajar dimînin. Jinên koçber diyar kirin ku li vir rastî gelek zehmetiyan hatin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-libnane-yen-ji-ber-erisan-reviyan-di-sert-u-mercen-giran-de-dijin-42981

Çavkanî:JINHA



## Jinên Yemenê ji bo mafê xwe yê hatine astengkirin têkoşînê dikin

Jinên Yemenê ku bi hinek zextên sînordarkirina geştê re rû birû mane, ji bo mafê xwe yê bingehîn, dest ji têkoşînê bernadin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-yemene-ji-bo-mafe-xwe-ye-hatine-astengkirin-tekosine-dikin-42978

Çavkanî:JINHA



## Bi xwarinên xwe çanda Rojhilatê Kurdistanê dide nasîn

Seher Eta bi riya karê xwe û çêkirina xwarinên cuda yên Rojhilatê Kurdistanê, çanda Rojhilatê Kurdistan bi xelkê Başûrê Kurdistan dide nasîn û xwarinên wê jî gelek tên hezkirin.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/xwarinen-xwe-canda-rojhilate-kurdistane-dide-nasin-42976

Çavkanî:JINHA



# Ji Platforma Jinan a Şahmaran rapora tundiyê ya 2023'yan

MÊRDÎN - Platforma Jinan a Şahmaranê ku daneyên tundiya li ser jin û zarokan a sala 2023’an li Mêrdînê eşkere kir, diyar kir ku herî kêm 5 jin û 5 zarok hatine qetilkirin û 11 jinan jî bi guman jiyana xwe ji dest dane.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/224554

Çavkanî:JINNEWS




# Di Meha Kanûnê de 27 jin hatin qetilkirin

NAVENDA NÛÇEYAN - Li gorî çeteleya tundiyê ya meha Kanûnê 27 jin û 2 zarok hatin qetilkirin, 15 jin û 4 zarokan jî bi guman jiyana xwe ji dest dan

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/224522

Çavkanî:JINNEWS



## Em talibên 13 şaredariyên Wanê ne: Em hêza xwe ji jinan digirin

WAN - Hevseroka DEM Partiyê ya Wanê Gonul Uzunay xebatên pêvajoya serlêdanên bernamzetiyê nirxand û wiha got: "Bi piştevanî û piştgiriyên li dora bernamzetan pêş dikeve di serî de şaredariya bajarê mezin em talibe 13 şaredariyên li Wanê ne. Em bi îdiane em hêza xwe ji gel, ji jinan û hevalên xwe digirin."

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/224520

Çavkanî:JINNEWS



## 'Rêbaza mental arîtmatîk ji bo fêrbûnê dibe alîkar'

Pispora Mental Arîtmatîk a Tunusê Saeeda Kalai, diyarkir ku di zarokan de fêrbûna zehmetî di 4 salî û şûnde destpê dike, ji bo derbaskirina zehmetiyên fêrbûnê dikarin Mental Arîtmatîk weke amûrekê bi karbînin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/amera-aritmatik-mental-ji-bo-ferbune-dibe-alikar-43000

Çavkanî:JINHA



## [Wênekêşa kêzikan bû, azweriya xwe veguhest hûnerên destan](https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/wenekesa-kezikan-bu-azweriya-xwe-veguhest-huneren-destan-42992)

Rebecca Chamoun a koleksiyona kêzikên wêneyê wab dikişîne dike, karê xwe ya ji ber pirsgirêkên tenduristiyê berda, bi hûnera destan pêktîne.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/wenekesa-kezikan-bu-azweriya-xwe-veguhest-huneren-destan-42992

Çavkanî:JINHA



## [‘Gotina dawî ya bavê min ‘xwedî li girtiyên nexweş derkevin’ bû’](https://jinhaagency.com/ku/rojane/gotina-dawi-ya-bave-min-xwedi-li-girtiyen-nexwes-derkevin-bu-42990)

Di girtigehan de binpêkirina mafan her diçe zêde dibe, girtiyên nêxweş dema bi mirinê re rû bir û dimînin tên tehliyekirin. Keça Abdulhalîm Kurtay Herdem Merwanî ku yek ji wan girtiyan e got: “Bila ji girtîgehan darbest dernekevin.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/gotina-dawi-ya-bave-min-xwedi-li-girtiyen-nexwes-derkevin-bu-42990

Çavkanî:JINHA



## Wek navê xwe têkoşînek ronak hişt!

NAVENDA NÛÇEYAN - Leyla Şaylemez ya li Parîsê hat qetilkirin, ewil bû Leyla Qasim piştre bû Ronahî. Leyla ku wek navê xwe têkoşîn mezin hişt, ji bo nifşê piştî xwe dibe hêz.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/224581

Çavkanî:JINNEWS



## ‘Ji azadiya serokatiyê ditirsin’

AMED - Jinên der barê tecrîda giran ya li ser Rêberê PKK’ê Abdullah Ocalan axivîn wiha gotin: “Mifteya aştiyê Abdullah Ocalan e û azad bibe wê hemû kes azad bibin. Ew ji azadiya serokatiyê ditirsin.”

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/224587

Çavkanî:JINNEWS




## Nûçegihana NûJINHA'yê xelata rêzgirtin û spasiyê girt

NAVENDA NÛÇEYAN - Rêxistina Pêşketin û Alîkariya Mirovî ya Somayê xelata rêz û spasiyê da nûçegihana Ajansa NûJINHA'yê ya Helebce Mîhrîban Selam Kakayî.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/224603

Çavkanî:JINNEWS



## Li Îranê cezayê 74 qemçiyan li aktîvîsta kurd hate birîn

NAVENDA NÛÇEYAN - Aktîvîsta Kurd Roja Heşmatî ya li bajarê Sine yê Rojhilatê Kurdistanê dimîne, ji ber ku wêneyekî xwe yê servekirî parve kir cezayê 74 qemçiyan lê hate birîn.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/224617

Çavkanî:JINNEWS



## [Ronak Zamanî bi salan bêyî ku piştgiriyek bigre çiyagertiyê dike](https://jinhaagency.com/ku/werzis/ronak-zamani-bi-salen-beyi-ku-pistgiryeke-bigre-ciyagertiye-dike-43029)

Çiyagera Rojhilatê Kurdistanê Ronak Zamanî diyarkir ku li beramberî jinên ku çiyagertiyê dikin sînordarkirin heye û piştgiriya madî û manevî nayê dayîn û got: “Ev 20 sale sedemê ewqas bihêzbûna min enerjî û motivasyona min e.”

https://jinhaagency.com/ku/werzis/ronak-zamani-bi-salen-beyi-ku-pistgiryeke-bigre-ciyagertiye-dike-43029

Çavkanî:JINHA



## ‘Hemû welat li beramberî sûcan bêdeng dimînin’

Nahla Al-Dabaa ya Misrî, balkişand ku li Xezayê ji bo jin û zarokan rêgezên mafên mirovan tune tên hesibandin û diyar kir hemû welat li beramberî sûcan bêdeng dimînin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/hemu-welat-li-beramberi-sucan-bedeng-diminin-43024

Çavkanî:JINHA



## Xwendekarên zanîngeha Koye: Divê hemû mamosta bibin yek

Xwendekarên zanîngeha Koye yên piştgirî dan boykota mamostayan a li Başûrê Kurdistanê, diyarkirin ku ger li seranserî hemû bajaran bi yek dengê hemû mamostayan bi hev re boykot berdewam bikira wê encamek baş bi xwe re anîba.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/xwendekaren-zaningeha-koye-dive-hemu-mamosta-bibin-yek-43018

Çavkanî:JINHA



## Bi bernameya 'Serokatî û Rêveberiya Projeyê' piştgirî didin ciwanan

Rêxistina Serokatiyên Jinê yên Proaktîf ên Morîtanyayê, bi armanca jinên ciwan karên xwe avabikin bernameya “Serokatî û Rêveberiya Projeyê” da destpêkirin. Hemû jinên di navbera temena 18-35 salî de dikarin beşdarî bernameyê bibin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/bi-bernameya-serokati-u-reveberiya-projeye-pistgiri-didin-ciwanan-43014

Çavkanî:JINHA



## ‘Ji bo pêşî li tundiyê bê girtin çareserî guherîna civakî ye’

AMED - Psîkolog Bahar Bayindir diyar kir ku di civakê de tundî wek riya çareseriyê tê dîtin û wiha got: “Ji bo pêşî li tundiyê bê girtin hewce bi guherîna civakî heye.”

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/224643

Çavkanî:JINNEWS



## EŞÎK di pergala fermuarê de bi israr e

ENQERE - Endama EŞÎK'ê û Seroka Komeleya Piştevaniyê ya Navenda Jinan a Edîrneyê Şahîde Agaoglû diyar kir ku jin ji bo bibin bernamzed  li gelek cihan serlêdan kirine û destnîşan kir ku ew di temsîliyeta wekhev de israr dikin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/224641

Çavkanî:JINNEWS




## Li Amedê jinek hat qetilkirin

AMED - Li navçeya Rezanê Pervîn Bal ji aliyê hevjînê xwe N.B. ve hate qetilkirin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/224632

Çavkanî:JINNEWS




## Gardiyanan gef li girtiya nexweş Hanîfe Arslan xwarin

Girtiya nexweşiya giran Hanîfe Arslan a 76 salî ya li Girtîgeha Tîpa T a Wanê de ye, gelek nexweşiyên wê hene û dema rakirine nexweşxaneyê, ji aliyê gardiyanan ve gefa "Em ê te bêyî tedawî bikin bibin girtîgehê" lê hat xwarin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/gardiyanan-gef-li-girtiya-nexwes-hanife-arslan-xwarin-43053

Çavkanî:JINHA



## [‘Lorîn hêrsa jinan a li dijî zextên civakê ye’](https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/lorin-hersa-jinan-a-li-diji-zexten-civake-ye-43047)

Nivîskar P. Yarî diyar kir ku lorînên ku dayik dibêjin, di heman demê de hêrsa li dijî zextên civakê ye, diyar kir ku lorîn yek jî derbûnna hêrsa jinan a li dijî civaka mêrsalariyê ye.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/lorin-hersa-jinan-a-li-diji-zexten-civake-ye-43047

Çavkanî:JINHA



## Girtiya Siyasî Saadet Akin ji bo sê siyasetmedarên Kurd stranek çêkir

Girtiya Siyasî Saadet Akin a 5 sal li Girtîgeha Jinan a Sîncanê tê ragirtin, ji bo sê siyasetmedarên Kurd Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez ku li paytexta Fransa Parîsê hatin qetilkirin stranek got.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/girtiya-siyasi-saadet-akin-ji-bo-se-siyasetmedaren-kurd-stranek-cekir-43044

Çavkanî:JINHA




## 'Divê ji bo jinên Lîbyayê projeyên aborî bên hilberandin'

Jinên ku li Lîbyayê tevî zextên civakê jî di jiyana kar de cih digrin, her çend wek yasayî nayên astengkirin jî tu piştgirî nabînin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-ji-bo-jinen-libyaye-projeyen-abori-ben-hilberandin-43041

Çavkanî:JINHA



## Yekîtiya Jinên Yemenê: Armanca me parastina jinan e

Yekitiya Jinên Yemenê ku li Yemenê ji sala 1968'an ve heta niha der barê bihêzkirina jinan de xebatan didin meşandin, diyar kir ku armanca wan ji tundiyê parastina jinan e.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/yekitiya-jinen-yemene-armanca-me-parastina-jinan-e-43039

Çavkanî:JINHA



## Rojnamevanên Jin: Em li ser rêya Sakîne Cansiz dimeşin

Rojnamevanên jin dibêjin li pişt qetilkirina Sara, Rojbûn, Ronahî ku li paytexta Fransa Parîsê dewleta tirk heye û gotin: “Sakîne Cansiz dixwest di nava jinan de hişyariyê ava bike, em jî li ser rêya wan dimeşin.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/rojnamevanen-jin-em-li-ser-reya-sakine-cansiz-dimesin-43035

Çavkanî:JINHA




## Darazandina 6 rojnamegeran destpêkir: Ne em hêzên ewlekariyê sûcdarin

6 rojnamegerên jin ên ku ji ber protestokirina operasyonên li dijî rojnamegeran Kurd tên darizandin, destpêkir. Rojnamegeran diyarkirin ku piştevaniya bi rojnemgerên Kurd re tên kriminalizekirin û gotin: “En ne sûcdarin, hêzên ewlekariyê sûcdarin.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/darazandina-6-rojnamegeran-destpekir-ne-em-hezen-ewlekariye-sucdarin-43068

Çavkanî:JINHA



# [Fatîma Khasropourîan a Îranî: Jin ji bo bixebitin du qat hewl didin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/fatima-khasropourian-a-Irani-jin-ji-bo-bixebitin-du-qat-hewl-didin-43065)

Hunermenda seramîkê Fatîma Khasropourîan, diyar kir ku pêwîst e zayendî li pêşiya pêşveçûna ber bi armancan ve nebe astengî û da zanîn lê di civaka Îranê de ji bo xebata jinan pêwîstî du qat bi hewldanan heye.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/fatima-khasropourian-a-Irani-jin-ji-bo-bixebitin-du-qat-hewl-didin-43065

Çavkanî:JINHA




# [Salwa Latîf: Divê jin dengê xwe bidin bihîstin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/salwa-latif-dive-jin-denge-xwe-bidin-bihistin-43064)

Seroka Yekitiya Jinên Navneteweyî a Sousse Salwa Latîf diyar kir ku tundiya li hemberî jinan belavî hemû qadan bûye û got: “Divê jin ji nû ve civakê ava bikin divê em bi hêz bibin û ji bo mafên xwe bixebitin.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/salwa-latif-dive-jin-denge-xwe-bidin-bihistin-43064

Çavkanî:JINHA



## [‘Li herema Kurdistanê 700 hezar xwendekar ji xwendinê bêpar in’](https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-herema-kurdistane-700-hezar-xwendekar-ji-xwendine-bepar-in-43062)

Nêzî sê mehan e xwendina li dibistanên li herêma Kurdistanê rawestiya ye lê belê heta niha hikumet û aliyên pêwendîdar ji bo çareserkirinê tiştek nakin. Mamoste Sirûşt Sîrwan got ku divê hikumet berpirsyariya xwe bi cih bîne.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-herema-kurdistane-700-hezar-xwendekar-ji-xwendine-bepar-in-43062

Çavkanî:JINHA



## ['Jin bi şikandina çerxa tundiyê dibin xwedî tecrubeyên serketî’](https://jinhaagency.com/ku/rojane/jin-bi-sikandina-cerxa-tundiye-dibin-xwedi-tecrubeyen-serkefti-43059)

Damezrînera Însiyatîfa Bar Aman Mayar Makkî, diyar kir bi "Komxebata Vegotina Çîrok" a ji bo jinan li dar xistine, bi parvekirina çîrokên tundiyê yên ku berê jin nikaribûn vebêjin, çerxa tundiyê dişkînin û ber bi serkeftinê ve gavan davêjin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jin-bi-sikandina-cerxa-tundiye-dibin-xwedi-tecrubeyen-serkefti-43059

Çavkanî:JINHA



## Leyla Arzû Îlhan: Sara ji bo têkoşîna azadiya jinên Kurd bû bingehek

Endama Meclisa Îştar a Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî Mexmûr, Leyla Arzû Îlhan der barê têkoşîna Sakîne Cansiz de axivî û diyar kir ku têkoşîna Sakîne Cansiz bûye soza bilindkirina têkoşîna hemû jinan.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/leyla-arzu-Ilhan-sara-ji-bo-tekosina-azadiya-jinen-kurd-bu-bingehek-43057

Çavkanî:JINHA



## Şandeya rêxistinên jinan serdana konê çalakiya welatiyên Taxa Newroz kirin

NAVENDA NÛÇEYAN - Kurdên taxa Newroz 10 roj in li dijî Te'rîbê di nava çalakiyê de ne. Şandeyek ji rêxistinên jinan bi armanca piştevaniya ji bo çalakvanan serdana konê çalakiyê kirin û hewlên dagirkeran şermezar kirin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/224815

Çavkanî:JINNEWS



## Gulser Ozbay piştî 31 salan ji girtîgehê derket

Yek ji girtiyên siyasî Gulser Ozbay, piştî 31 salan ji girtîgehê derket. Gulser Ozbay, bal kişand ser berxwedan û têkoşîna li girtîgehan û wiha got: “Em niha nikarin azadiyê bijîn. Aliyek me her dem li wir e."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/gulser-ozbay-pisti-31-salan-ji-girtigehe-derket-43088

Çavkanî:JINHA



## Bi rêya Ar Galeriyê xeyala xwe ya zarokatiyê pêk anî

Jina ciwan a şêwekar Jîlya Xelîl bi rêya galeriyê, tabloyên xwe û yên çend hunermendên din ên Kurd kom kirine, dixwaze hunera şêwekariyê bike çand.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/bi-reya-ar-galeriye-xeyala-xwe-ya-zarokatiye-pek-ani-43085

Çavkanî:JINHA



## Jinên li Kirmanşahê mafê keda xwe nagirin

Di fuara "Mobîlya, awîze û malzemeyên ji bo razanê" ya li Kirmanşahê hat lidarxistin de, hejmara zêde ya jinan balê kişand. Jinên beşdar bûn ji newekheviya mûçe û zexten civakî bi gilî bûn.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/jinen-li-kirmansahe-mafe-keda-xwe-nagirin-43078

Çavkanî:JINHA



## Jinên Suweydayê:Têkçûna aborî gelek beşan bandor kir

Jinên Suweydayê ên ku balkişandin ji ber polîtîkayên hikumetê li welat di salên dawî de têkçûnek aborî tê jiyîn diyarkirin ku ev bû sedem ku gelek beş ji vê rewşê bandor bibin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-suweydaye-tekcuna-abori-gelek-besan-bandor-kir-43075

Çavkanî:JINHA



## 'Ji bo pêşîgirtina li sinetkirina jinan divê hîn zêdetir xebat bên kirin'

Parêzer Naour Al-Huda Walî Al-Dîn, da zanîn li Misirê tevî qanûnan jî 'sunetkirina jinan' û zewaca temam biçûk berdewam dike û diyar kir divê ji bo astengkirina van pirsgirêkan hîn zêdetir xebatên hişyariyê bên meşandin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-ji-bo-astengkirina-sinetkirina-jinan-zedetir-hewildan-be-nisandan-43097

Çavkanî:JINHA



## Mama Munîra ya Gundê Zarokan: Min xwest hezkirina parve bikim

Munîra Al-Kasrawî ya hilbijart ku bibe dayika zarokên sêwî yên li 'Gundê Zarokan', wiha got: "Min xwest hezkirina xwe bi wan re parve bikim.” Munîra Al-Kasrawî heta zarokan mezin dibin, rêberiyê ji wan re dike.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/mama-munira-ya-gunde-zarokan-min-xwest-hezkirina-parve-bikim-43099

Çavkanî:JINHA



## Li Girtîgeha Jinan a Şakranê zext zêde bûn

Girtiyên ku diyar kirin li Girtîgeha Jinan a Şakranê piştî destpêkirina greva birçîbûnê zext zêde bûn, dixwazin daxwazên wan bên bicihanîn.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-girtigeha-jinan-a-Sakrane-zext-zede-bun-43100

Çavkanî:JINHA




## Daxwaza taloqkirina înfaza Hanîfe Arslan a 76 salî hat redkirin

Daxwaza taloqkirina înfazê ya ji bo yek ji girtiyên nexweş ên li Girtîgeha Tîpa T a Wanê Hanîfe Arslan a 76 salî hat kirin, hat redkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/daxwaza-taloqkirina-infaza-hanife-arslan-a-76-sali-hat-redkirin-43102

Çavkanî:JINHA




## Piştevaniya Mor banga beşdarbûna sempozyûmê li jinan kir

Piştevaniya Mor, bang li hemû jinan kir ku beşdarî sempozyûma bi sernavê "Di Krîza Kapîtalîzma Patriyarkal de Tecrubeyên Têkoşîna Femînîst a Navneteweyî" ku wê 14'ê Çileyê roja Yekşemê bê lidarxistin, bibin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/pistevaniya-mor-banga-besdarbuna-sempozyume-li-jinan-kir-43105

Çavkanî:JINHA




## Halîse Aksoy: Ez li vir li berxwe didim

AMED - Halise Aksoy a bi beyanên Umit Akbiyik hat girtin, nehat tehliyekirin. Ev biryar li eywanan dadgehê bi tilîlî û çepikan hat şermezarkirin. Haliseyê li eywana dadgehê got:"Min meraq nekin, ez li vir li berxwe didim."

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/224881

Çavkanî:JINNEWS




**Nûçeyên herêmî**

# Zarokên Qampa Tel Al-Samen amadekariya pêşerojek bê şer dikin

Perwerdekarên ku li Kampa Tel El-Samen a dikeve Bakurê bajarê Reqayê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê hemû şert û mercan ji bo pêşeroja zarokan pêk tînin, diyar kirin ku ew hewl didin şarezayên zarokan ên weke stranbêjî û wênesaziyê pêş bixin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/zaroken-qampa-tel-al-samen-amadekariya-peserojek-be-ser-dikin-42998

Çavkanî:JINHA



# Jinên koçber ên li Idlibê: Me hêviya xwe ya ji bo jiyanê winda kir

Jinên ku ji ber bombebaranan axa xwe terikandin û di şert û mercên giran ên li kampan de jiyana xwe didomînin, diyar kirin hêviya xwe ya ji bo jiyanê windakirin û xwestin şert û mercên jiyana wan bên başkirin.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/jinen-kocber-en-li-idlibe-me-heviya-xwe-ya-ji-bo-jiyane-winda-kir-42991

Çavkanî:JINHA



## Ava baranê ji jinên Zirganê re dibe çavkaniya jiyanê

Di vê pêvajoya ku êrîşên dewleta Tirk gelek krîz bi xwe re ava kir, jinên navçeya Zirganê bi derfetên herî biçûk çareseriyên demkî dibînin û xwe bê alternatîf nahêlin.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/ava-barane-ji-jinen-zirgane-re-dibe-cavkaniya-jiyane-42988

Çavkanî:JINHA



## Xwişka çeteyekî DAIŞ: Divê malbatên DAIŞ'ê vegerin welatên xwe

Xedîce Silêman xwişka çeteyekî DAIŞ'ê ye dibêje ku divê dewlet berpirsiyariya hemwelatiyên xwe yên li kampên El-Hol û Roj bigrin û wan hemûyan ji ber ku bi riyên derqanûnî derbasî xaka Sûriyeyê bûne, dadgeh bikin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/xwiska-ceteyeki-daiS-dive-malbaten-daiS-e-vegerin-welaten-xwe-42987

Çavkanî:JINHA



## [‘Ji bo amadekarina Hevpeymana Civakî beşdarbûna jinan ji sedî 50 bû'](https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-bo-amadekarina-hevpeymana-civaki-besdarbuna-jinan-ji-sedi-50-bu-43015)

Nura Al-Hamîd, destnîşan kir beşdarbûna jinan a di amadekirina Hevpeymana Civakî ya ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tê pêkanîn ji sedî 50 ye û balkişand ev pêşketin yek ji destkeftiyên Şoreşa Jinan a Rojava ye.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-bo-amadekarina-hevpeymana-civaki-besdarbuna-jinan-ji-sedi-50-bu-43015

Çavkanî:JINHA



## [Şehîdên komkujiya yekemîn a Parîsê li Dêrazor û Lubnanê hatin bibîranîn](https://hawarnews.com/kr/sehiden-komkujiya-yekemin-a-parise-li-derazor-u-lubnane-hatin-bibiranin)

Şêniyên kantona Dêrazorê û Kongra Star a Lubnanê hersê têkoşeran Sakîne, Fîdan û Leyla bi bîr anîn û soza şopandina rêya şehîdan û rizgarkirina deverên dagirkirî nû kir.

https://hawarnews.com/kr/sehiden-komkujiya-yekemin-a-parise-li-derazor-u-lubnane-hatin-bibiranin

Çavkanî:ANHA



## [Berdevka Meclîsa Jin a PYD'ê: Êriş li ser Netewa Demokratîk e]

Berdevka Meclîsa Jin a PYD'ê Netewî Xemgîn şerê cîhanê yê sêyemîn ku didome, êrişên dewleta Tirk yên li ser heremên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê nirxand, destnîşan kir ku êriş li ser paradîgmaya Netewa Demokratîk e.

https://jinhaagency.com/ku/siyaset/berdevka-meclisa-jin-a-pyd-e-Eris-li-ser-netewa-demokratik-e-43009



## [Şervîn Nûdem: Sara navê serhildanê ye]

Endema Akademiya Jineolojî Şervîn Nûdem ya ku Sakîne Cansiz nas kiriye, got "Sara navê serhildanê ye" û destnîşan kir ku ew bi ked, têkoşîn û mîrateya li pey xwe hişt ji bo avakirina konfederalîzma demokratik ya jinên cîhanê hê pêşengiyê dike.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/Servin-nudem-sara-nave-serhildane-ye-43033

Çavkanî:JINHA



## Werzîşvana siwariyê Perwîn Dummar: Divê em xeyalên xwe pêk bînin

Perwîn Dummar a li bajarê Reqayê ku tevî hişmendiya civakê jî dest bi werzîşa siwarbûna hespan kiriye got: “Rêveberiya Xweser piştgirî dide jinan ku kêrhatiyên xwe di hemû waran de bi pêş bixin” û xwest ku jin xeyalên xwe pêk bînin.

https://jinhaagency.com/ku/werzis/werzisvana-siwariye-perwin-dummar-dive-em-xeyalen-xwe-pek-binin-43066

Çavkanî:JINHA



## Li Tebqayê pêşbirka bezê ya jinên ciwan hat lidarxistin

Nivîsgeha Lîstikên Jinan a Meclisa Werzîşê ya kantona Tebqayê pêşbirka bezê ya taybet bi jinên ciwan li dar xist.

https://jinhaagency.com/ku/werzis/li-tebqaye-pesbirka-beze-ya-jinen-ciwan-hat-lidarxistin-43091

Çavkanî:JINHA



## ['Em ê ji bo jiyaneke bi rûmet berxwedana xwe bidomînin']

Asom İsmaîl a ku ji ber dagirkeriya dewleta Tirk neçar maye koç bike 6 sale li Şehbayê dijî, bi firotina muhelebî û saleb debara xwe dike. Asom Îsmaîl diyar kir ku ew ê ji bo jiyaneke bi rûmet berxwedana xwe bidomînin.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/em-e-ji-bo-jiyaneke-bi-rumet-berxwedana-xwe-bidominin-43077

Çavkanî:JINHA



## ['Divê em piştgirî bidin berxwedana li girtîgehan']

Zahîde Îshak, diyar kir ku hemleya gerdûnî ya li dijî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan berfirehtir dibe û banga piştgiriyê berxwedana li girtîgehan kir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-em-pistgiri-bidin-berxwedana-li-girtigehan-43076

Çavkanî:JINHA



# Li Efrînê 2 xwişk hatin revandin

Li gorî Rêxistina Mafên Mirovan a Efrînê, çeteyên girêdayî dewleta Tirk li Efrînê 2 xwişk revandin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-efrine-2-xwisk-hatin-revandin-43096

Çavkanî:JINHA



Kongr Star

13/1/2024